Newroz





Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

Hejmar ( 90 ) Sibat 2010 z - 2621 k Buha ( 15) )

# Rewşenbîr û nivîskarê Kurd
# REZOYÊ OSÊ Koça dawîn bar kir



nivîskariyê de bi navê REZO hatiye naskirin, sala 1950î, li gundê **Degşûriyê** ji diya xwe bûye. Xwendina xwe ya seretayî li gundê Tenûriyê kuta kiriye û ya navîn û lîseyê jî li bajarê Qamişlo biriye serî. Sala 1980î, Endezyariya Petrolê ji Amojgeha Kopkîn li Moskoyê wergirtiye. Navê xanima wî Nîgar e, keça kesayetiya welatparêzî yê navdar birêz Samî yê Mele Ehmedê Namî ye. Du kurên wan bi Navê Salar û Rolan hene, û ew xwendina xwe li zanîngeha Istenbolê didomînin.

Ji salekê vir ve, wî gazinc ji êşa pişika xwe kiriye, piştî analîzan, hatiye zanîn ku nexweşiya penceşêr a malmîrat pencên xwe berdane hundirê pişika wî û ew guvaştiye!. Piştî kêferat û berxwedana derdora salekê bi vê nexweşiyê re, roja pêncşembê 04.03.2010Z, canê xwe yê pak sipartiye Xwedê û çavên xwe girtine.

Roja Înê 05.03.2010an, piştî nimêja nîvro, termê wî bi beşdariya gelek rewşenbîr, zimanhez, welatparêz, siyasetvan û saziyên mafên mirov li gundê wî Degşûriyê bi xemgîniyeke mazin hate veşartin. Piştî veşartinê, birêz Konê Reş gotarek li ser kurtejiyana wî xwend, paşê, birûska serxweşiyê ya Kovara wî PIRS ku 17 salan xebat di desteya wê de kiriye hate xwendin. Birêz Arşek Baravî jî gotareke balkêş bi navê rewşenbîrên bajarokê Amûdê xwend û li **D.R.(10)**

Email : Newroz 95 @ hotmail . com

JI Ê MÊRTIR RE
Kovara RONAHÎ 3

Bûyera Lehiyî
Hesenê Cumî 5

Danezana gerdûnî ya mafên mirovî
Dr. Kamîran Bêkes 6

Kuştina jinan
Salih Cefer 8

www.arsiv.kurdi.org

## Du Şevbiwêrkên Çandî

Di pêvajoya çalakiyên xwe de yên mehane, girûpa Tirbesipiyê ya Çanda Kurdî / 2 / şevbiwêrkên çandî li dar xistin. Di ya pêşî de, û di bin sernava (Soparo Welatê Hûriyan), nivîskar li ser wateya (Soparo) û girêdanên vê têrmê bi dîrok û qadnîgarî (cugrafî ) yê ve û bûyerên di heman demê de, baş rawestiya. Di şevbiwêrka dudiwan de nivîskar li ser Şoreşa Oktoberê baş sekinî, û bi ferehî li ser sedemên herifandina wê baş rawestiya. Di herdu şevbiwêrkan de kesên mêvan bi pirs û nêrînên xwe herdu babet têr û zengîn kirin.

**Rêkxistina Tendiristiyê li Cîhanê (WHO) raporeke balkêş di derbarê rewşa keçên di bin bivê de weşand.**

Li gora wê raporê, bêhtirî 100 mîlyon keç li cîhanê di bin biva sinetkirinê de ne. Rapor diyar dike ku her sal zêdetirî 3 mîlyon keç, ji ber egerên olî têne sinetkirin. Piraniya wan keçan, li Efrîqa, Asya û Rojhilata navîn rastî wê êşkenceyê tên.
(WHO) di rapora xwe de destnîşan dike ku , hejmara keçên di bin metrisiya sinetkirin û zilm, zor û êşkenceyê de xwe digihîne 140 mîlyon keç.

### Heval Reşîd Ereb jî Barkir



Heval Reşîd Qasim Ereb sala 1939, gundê Dîmedaşî ji dayîk bû ye. ji sala 1963 an ve , ta dawiya jiyana xwe di nav refê tevgera Kurde dixebitî. Di 07-03-2010 çavîn xwe damrandin , roja dî bi beşdariya xwedî dost û hevalan li gorstana ziyareta Henên bin ax dibe . li ser gornê gotinek bi navê partiya wî – P .Y . D . K .( Yekîtî) tê xwendin.
Bila sere xwedî, hogir û hevalan saxbe.

## Birca Belek

Di 22 ê Sibatê de. di bernameya Bergeh a ASOsat TV de ya bi birêvebiriya rojnamevan Cemal Batun û panelistên Bergehê-siyasetmedar Dara Bilek û nivîskar Keya Îzol bûyerên girîng ên hefteya derbasbûyî di derdora Pirsa Kurd li Tirkiyê rûdayî de girtin destan, herweha rewşa vegera Qesra Birca Belek û derketina eskerên Tirkan ji Bircê nirxandin. Ji paytexta Kurdistana Federe - Hewlêrê, Mîra Kurd Sînem Bedirxan jî bi riya telefonê beşdarî bernameya Bergeh bû û li ser rewşa Bedirxaniyan di dîroka Kurd de, li ser rewşa Bedirxaniyan a îro, Qesra Birca Belek û herweha pirojeya Vebûna Kurd jî, dîtinên xwe anîn zimên. Sînem Bedirxan got ku: "Hêvîdar e jiyana wê dest bide ku azadiya beşê mezin a Kurdistan jî bibîne..."
Mîra Sînem Bedirxan diyarkir ku " Birca Belek cîgeha kultur, huner, edebiyat û çanda Kurd û Kurdistanê ye. Ew hêvîdar e, carek din dê bibe navenda huner, kultûr û çanda Kurd. Ji kûraniya dilê xwe dixwaze ku rojekê dê bikaribin termê Mîrê Kurd - Mîr Bedirxan jî bînin xaka welatê xwe, Birca xwe ya Belek. Birca Belek sembolek Kurdan girîng e û derkeftina eskeran ji Qesra Birca Belek tiştekî dîrokî ye!..."
Sînem Bedirxan diyar kir ku baweriya wê bi Tirkan nayê, welatê Kurd ê dagirkirî zordestiyên mezin ji vê dewletê dîtin e. Bedirxaniyan zehmetiyên mezin ji destê Tirkan dîtin e... Surgun, asîmîlasyon, derbederî, zordestî... û H.W.D . Bi ser vê yekê jî hêvîdar e ku pirojeya Vebûna Kurd bikeve rê de!...

## Dr. Nûrî Şitlo goçkir



Li roja înê 26-02-2010 Dr Nûrî hevnasê xebatkar û gernasên mezin: Mîna Mûsa Enter- Hemreş Reşo- Dr.Nûrî Dêrsimî û Yaşar Kemal çav damrandin. Li roja dî şemî 27-02-2010 li goristana gondê Coqê –Efrîn- bi beşdariyeke mezin ji xwedî , dost, hogir û cureyên civaka Sûrî bin ax bû .
Bila dost ,hogir û gel xweş û saxbin.

www.arsivakurdi.org

# JI Ê MÊRTIR RE (*)

Di bajarekî welatê Ûris de rojnamevanên biyanî fabrîkeke çekan ziyaret dikir. Yekî ji wan di heqê wê ziyaretê de bendek nivîsandiye û tê de çîroka jêrîn gotiye:

Gava ez gihaştibûm fabrîkê wextê xebatê temam bûbû û Emele di hewşê re derbas dibûn û diçûn avahiya pêşmiqabil, xwarina Emelan tê de bû. Emele di ber me re wek çemekî boş diherikîn. Bê hemtê min çavên min bi xort û keçikekê ketin. Keçik, keçikeke delal, bi difina xwe a ber bi jor tîpê jinên rûsî dinimand. Hevalê wê xortekî esmer bû û cilên deryavanan lê bûn. Xort lingê xwe ê çepê bi awakî neadetî datanî erdê. Qey lingê wî bê wî pêlê dikir; hêj bêtir wek darekî hişk diket erdê. Mihendisê ku rêberiya me dikir, wî jî li wan nihêrî û gote me: Reben dikule, lê çi qehreman e.


SAL 1
HEJMAR 8
YEKŞEMB
1 ÇIRIYA PAŞIN 1942
RONAHÎ
ANNEE 1
NUMÉRO 8
DIMANCHE
1 NOVEMBRE 1942
SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

Mihendis hinek sekinî û paşê got: Vî xortî û vê keçikê çîrokeke ecêb heye. Navê keçikê Klêva ye. Berî deh mehan keçik di xestexaneyên eskerî de dixebitî. Ne ku li nexweşan difedkirî; lê di defterxana xestexanê de bi nivîsanê mijûl dibû. Herwekî hûn dizanin jinên me ji eskerên me yên ku di eniya şer de ne, diyariyan dişînin. Îcar Klêvayê jî rojekê rabû pakêteke diyariyê çêkir û ew ji eskerên eniyê re şand. Dîsan bûye adet, jinika ku diyariyê dişîne resmekî xwe di pakêtê dike û li rex resmê xwe nav û adrêsa xwe û ji eskerê nenas re çend pirsên şîrîn jî dinivîsîne. Klêvayê jî li gora adetê resmê xwe di pakêtê kir û li rex nivîsand: "Ji ê mêrtir re" yanî ji wî eskerî re ku di şeran de ji hemiyan mêrtir derketiye. Diyariya Klêvayê digel diyarîne din gihaşte eniyê û di dema belavbûna diyariyan de ya Klêvayê bû nesîbê deryavanekî bi navê Sarc.

Sarc pakêt vekir, li resmê keçikê temaşe kir û lê heşmetkar ma. Lê gava tiştê li rex nivîsandî xwend dudilî pê re çêbû. Gelo, ew di nav hevalan de ji hemiyan mêrtir bû. Sarc dida eqilê xwe û qaîliya xwe pê ne tanî. Dawiyê resm û pakêt girtin; çû cem zabitê xwe û got ê:

-Ev pakêt dane min; lê ez bawer nakim ku di nav hevalan de ê mêrtir ez im; Ji lewre...

Zabit resim girt, lê temaşe kir; ew şanî eskerê xwe da û ji wan pirsî:

-Çawan, we ev keçik eciband?. Deryavanan yekdeng û yekawaz got:Gelek, gelek...

Zabit got: Xwediya wê dibêje ev resim ji ê mêrtir re ye; ê mêrtir kî ye?

Zabit dîsan got: Lê di nav we de ê mêrtir kî ye?. Bila ew gavekê ber min ve were.

Li ber vê pirsiyayê deryavanan xwe ker kir. Hemî mêr, hem mêrine qenc bûn. Lê dîsan hemî wek her mêre qenc nefspiçûk man.

Zabit bihinekê sekinî û dîsan got: Emê îro dirêjî dijmin bikin, di vê êrîşê de mêrtirê we ezê bi xwe bibijêrim û resmê delalê bidime wî. Zabit resim kire bêrîka xwe û piştî saetekê deryavanan berda tabyeke dijmin. Sarc di nava sefên dijmin re xwe gihande betariyên neyar bi destbombeyên xwe bera topçiyan da û ew revandin. Hevalên wî gihane ser û betarî zemt kirin. Fermandariyê bi nîşanekê Sarc mikafat kir û zabitê wî resim dayê. Sarc resmê delalê kire kûrika xwe a çepê û ew li dilê xwe şidand. Sibetirê tabûra Sarc dîsan rabû êrîşê. Sarc vê carê hêj bêtir mêranî şanî da. Lê piştî êrîşê, darûbestekê ew vegerande qerargehê. Sarc birîndar bûbû. Birîna wî xedar bû. Ew guhastin xestexaneke ji eniyê dûr. Xestexana ku Klêva tê de dixebitî.

**D.R ( 10 )**

www.arsivakurdi.org

# Birêz Mihyedîn Şêx Alî digel paltokê bi cîgeha Şevger re

**Xemxwarê welêt**

**Piştî** min li ew çend kîteyên devkî yên bersivî yên mamoste M.Ş.A di paltokê de , bi cîgeha Şevger re guhdar kir . Herweha ew çend nirxandinên ji wê axaftinê re, yên mamoste Mihemed Se,îd Alocî û Cankurd jî xwendin; Min dît , ku pêwîste ez hin bersivên mamoste Ş.A û nirxandinên herdu mamostên li jor bi nav bûne û ew wergerandina erebî ya wan bersivan , bi çend têbînan binirxînim.

Bi rastî pirsên ku ji mamoste Ş.A hatine pirskirin ne xuya ne , lê ji bersivan mirov têdighê , ku pirs çi ne ?.Mamoste weha bersivên pirsa dirêse : 1- Ala Sûriyê , ala me ye jî , em rêza wê digrin û diparêzin , û em ne bi çirandin û binpêkirina wê re ne , wek ku hin dixwazin bi wî awayî licûyê yan bicikirinê werbigirin . 2- Çareserkirina pirsa netewî ya Kurd li Sûriyê di siya vê heyam û rijîmê de ne gengaze . Lê, gengaz heye em bi hev re wek Tevgera Kurd li Sûriyê digel hêzên niştimanî , ji vir ta çend salên bê , kanibin ew çewtiyên dîrokî ku, di dermafê gelê Kurd de kiriye serast bikin . Wek nimûne : Kembera erebî , serjimara awerte , hilanîna erebkirinê,….û H.W.D. 3- Di bikaranîna têrmên mîna tayifî û diktatorî , me di belge û weşanên xwe de bi kar nanîne. Lê em dibînin rijîma Be,is rijîmeke nijad û giştî ye , mîna rijîma Çawsîsko li Romaniya û rijîmên li Rojhilatî Ewropa. Guherînên em dozdikin , guherînên demoqrat û li dû hev, Kurd û Ereb bi hev re , û li ser şopa Danezana Şamê . 4-Ez ne bawer im wek kes, otonomî û federalî, li Sûriyê dirûşmên xebatê ne , tenê şaşiyên dewletê yên dîrokî,di dermafê gelê Kurd de, di van çend salên bê de, bi xebata me tevan , çi siyasetvan û rewşenbîrên Kurd ,gengaze ji holê rabin . Herweha ez bawerim ,ku rêvebirên partiyên Kurd gihane zanîna ku xebat ne tenê bi hildana dirûşman e û hew. Ya rast ew e , ku dirûşmê were hildan , divê li derve û hundir , mirov lê xwedî derkeve . 5-Taybetmendiyek rewşa Kurd li Sûriyê heye . Em tu Kurdistana li Sûriyê çênakin. Em wek partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , pirogrameke me rêzanî , zarzimanek û ragihandineke me berpirsiyar heye. Herweha em naxwazin bi du rûyan, du zimanan û minafiq bin. Em wek P.Y.D.K rêza serokomar digirin, herweha em jî, û ez bawerim partiyên Kurd ên dî jî , çi daxwazên xwe hebin , ew ji serkomar doz dikin.

Ji van bersivên mamoste dixuye ku ew bi tevayî, li gor pirograma rêzanî ya P.Y.D .K axivî ye .Lê di baweriya min de , li hin ciyan şaş çûye. **1**- Kembera erebî,serjimara awerte , erebkirin …..ne şaşî ne , ew siyseteke pilankiriye , û ji bo tunekirina gelê Kurd e .**2**-Raste çirandina ala Sûriyê tiştekî şaşe û zirar jê heye , lê , ne her kesê ku diçirîne keysebaze û dixwaze li welatê lê , pê were bi cikirin.Di baweriya min de ne hewcebû mamoste ev gotina dawiyê bigota .**3**- Gereke serokomar ciyê rêzgirtinê be, lê , ew di ber van ton siyasetên bi ziyan di derheqê xelkê Sûriyê bi tevahî û ya gelê Kurd de bi taybetî , **D.R ( 11 )**

www.arsivakurdi.org

# Bûyera Lehiyî

**Bîrewerîn**

**Hesenê Cumî**

Li ezmanê çiyayê Hawarê , tîrêjên rojê ewran diqelêşin , perên xwe bi ser Hawarê de berdidin . Sûsin , kulîlk û giya , Çiyayê Hawarê xemilandine . Bihna buhara rengîn dikeve pozê mirovan . Dengê bilbil û şalûran , mîna sînfoyonekê , bi ber gelî û nawalan dikeve .

Ji nişka ve , qîrî bi gînawer û teyrikan dikeve , ewrekî reş û tarî bi hev dikeve , baran bi hêz dibare , deziyên baranê mîna tenên tizbiyan , bi ser Çiyayê Hawarê de têne xwar , ax , giya , kulîlk , zinar û latên Hawarê , bi ber pêlên lehiyê dikevin û di gelî û newalan re serqotî hev dibin .

Hemo , koka dara êvrisê hembêz dike û xwe dimelisîne . Di demeke kurt de , her tişt tê guhartin . Li şûna , kulîlk û giyayê Hawarê , bilî darên tamarên xwe kûr berdane erdê nema ye . Ev bûyer , Hemo vedigerîne şeva reş û tarî , şeva ku bi hêz li derî dikeve, bêtirî panzdeh leşkeran , derdora malê çember kiribûn , di ber cilên xewê û çav girtî de, dibin paş deriyê reş . Ew deriyê ku , mirov ji hezarên salan ve , ji ber dike qîr , hawar û dinale , deriyê jiyana mirovan dixwe , deriyê ku , têde dixwazin mirovatiya mirovan wenda bikin , bipişêvin û mêraniya wî bişkînin . Di paş wî derî de , bi hezaran xort û keçan hatine girtin . Hîn Hemo di wê xwenê de ye . Kevokek xwe bi hêrs davêje hembêza wî . Kevok , ji tirsa re diliklike , Hemo kevokê hembêz dike destê xwe di ser govdê wê re dibe û tîne . Rasterast , liklikandina wî , li pêş serbazê polîs tê ber çavan . Kevoko ?! . Ew tirsa , ji hezarên salan ve di dilê mirovan de hatiye çandin . Ta kîngê , wê ta kîngê bimîne ?!. Ta kîngê wê ji vê tirsê rizgar bibe ?.

Piştî kevok germ bû , kevok berda , kevok bi banî ket, di ser serê wî re, basikên xwe hejand . Qey tu dibêjî kevok sipasiya wî dike . Wê hîngê , bejina Roşînê ya zirav , porê dirêj û tarî, çavên reş û belek , rûyê geş û dîmê top , dîtina pêşîn ya li ser kaniya jorîn , soz û peymana wan bi hev re , destlibakirina dawî ya şeva girtinê bi bîra wî têne .

Lehî geyîkekê ( xezalek ) bi çûk dide ber xwe û berve newalê dikşîne , geyîk , bi hemî hêza xew ve , hewil û berxwe dide da ji nava lehiyê derkeve . Lê mixabin , hêz û hovîtiya lehiyê nahêle ew ji wê bûyerê rizgar bibe û jiyana xwe berdewam bike.

Ev jî, wî vedigerîne xişm û bêtara 12 ê Avdara 2004 an, ya li bajarên Qamişlo, Serê Kaniyê, Dirbasiyê, Amûdê, Tirbesipiyê, Kobaniyê, Heleb, Zorava û Efrînê qewimî ne. Fîşekê di dilê Gîvara, neviyê Hemîtê kal re debas bû ye. Kuştina hunermendê daholvan Ne'so di bin lêdanê de, kuştina keça çeleng Ferîde û xwîna hemî şehîdan, yên bi hezaran kulîlk bi xwîna xwe avdane tên ber çavên wî.

Di bin darê de, Hemo ji xwe dipirse: Gelo, ma ev xişm û bêtara vê lehîyê, ne mîna xişm û bêtara bûyera 12 ê Avdara 2004 an e ?!. Ma ne herdu jî, hov in, li kuştina mirovatiyê digerin !. Dixwazin jiyanê bê mirovatî bikin !!.



www.arsivakurdi.org

# Danezana gerdûnî ya mafên mirovî (*)

Wergêr:Dr. Kamîran Bêkes

## Sereta

Ji ber ku venasîna rûmeta pêgir a hemû endamên malbeta mirovî û mafên wan ên wekhev û payedar li cîhanê bingeha azadî, dad û aştiyê ye;

Ji ber ku piçûkdîtin û rêzlênegirtina mafên mirovî bûne egera kiryarên hov yên ku wijdana mirovhiyê bi tundî azar kirine, û ji ber ku avakirina cihanekê, ku tê de mirov di peyvîn û bawerkirinê de serbest bin û ji tirs û belengaziyê rizgar bin, wek xwasteka bilindtirîn a tevahiya mirovatiyê hatiye danezankirin;

Ji ber ku girîng e mafên mirovî ji alî destlata yasayî de bên parastin da ku mirov bêçar nebe ku, wek çareya dawîn, penayê serhildana li dijî zordarî û çewsandinê bibe;

Ji ber ku pêşvebirina peywendiyên dostaniyê di navbera neteweyan de bingehî ye,

Ji ber ku gelên Neteweyen Yekbûyî di Peymana (destûra) xwe de ji nû ve baweriya xwe ya bi mafên mirovî yên bingehîn, bi nirx û rûmeta kesayetiya mirovî û bi wekheviya mafên mêr û jinan dane zanîn, û ji ber ku biryar dane ku alîkariyê bidin pêşveçûna civakî û bicihkirina asteke jiyanê ye çêtir di nav serbestiyeke firehtir de;

Ji ber ku dewletên endam li xwe girtine ku, bi hevkariya Neteweyên Yekbûyî, ji bo peydakirina rêzgirtin û çavdêriyeke giştî ya bi mafên mirovî û azadiyên bingehî, kar bikin;

Ji ber ku têgihîştina hevbeş a van maf û azadiyan ji bo bicîhanîna tevaya vê lixwegirtinê ji giringiya bilindtirîn e,

**lewre Civîna Gelemper vê Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovî** wekî asteke hevbeş **radigihîne** ku divê armanca hemû gel û neteweyan be, da ku hemû kes û hemû desteyên civakê vê Danezanê timî li ber çav bigrin û, bi riya hînkirin û perwerdekirinê, li pênawî çespandina rêzgirtina van maf û azadiyan bixebitin û bi tevdîrên pêşketî yên neteweyî û navneteweyî nasîn û bicihanîna wan ya gerdûnî û karîger, çi di nav gelên dewletên endam bi xwe de, çi jî di nav gelên wan deverên ku li jêr desthilata wan de ne misoger bikin.

**Benda 1.**

Hemû mirov azad û di rûmet (paye) û mafan de wekhev ji dayik dibin. Hiş û wijdan bi wan bexşkirî ne û divê ligel hev bi giyaneke biratiyê reftar û têkildar bibin.

**Benda 2.**

**1.** Ji mafê herkesekî ye ku bê tu cidahiyan, wek cidahiya bi hoya nijad, reng, zayend, ziman, ol, ramana konevanî (siyasî) yan her ramaneke dî, binemayê netewî yan a civakî, sermiyan, zayîn an tu rewşên dîtir, hemû maf û azadiyên ku di vê danezanê de hatine binavkirin bi dest xîne.

**2.** Bi ser de, nabe tu cidahî ji ber statuya rêzanî, yasayî an navneteweyî ya welat an navçeya ku kesek jê tê, bête kirin, çi eger ev welat an navçe serbixwe, li jêr dest, ne xweser (otonom) an li jêr her sînorkirin û bendkirineke din a serweriyê be.

**Benda 3.**

Herkes xwedî mafê jiyan, azadî û ewlehiya kesane ye.

**Benda 4.**

Nabe tukes di koletî an bindestiyê bête girtin; koletî û bazirganiya koleyan bi hemû teşeyên xwe ve qedexe ye.

**Benda 5.**

Nabe tukes toşî hingavtin an sizadan û reftareke hov, nemirovane û kotîker bibe.

**Benda 6.**

Herkesî maf heye ku li her ciyekî weke kesayetiyeke yasayî bête venasîn. →

www.arsivakurd.org

**Benda 7.**

Hemû mirov li ber yasayê wekhev in û hemûyan, bê tu cidahî, mafê parastineke yasayî ye wekhev heye. Hemû mirov li hemberî her cidahiyeke ku vê Danezanê binpê dike û li hemberî her navtêdana cidahiyeke wilo xwediyê mafê parastineke wekhev in.

**Benda 8**

Herkesî maf heye ku li hemberî kirinên ku mafên bingehîn yên ku yasa an destûr jê re dinasin binpê dikin serî li dadgehên neteweyî yên serwer bixe.

**Benda 9.**

Nabe tukes bi awayekî remekî bête girtin, bindestkirin an sirgûnkirin.

**Benda 10.**

Herkesî, di wekheviyeke tewaw de, maf heye ku doza wî li ber dadgeheke serbixwe û bêla bi awayekî rewa û aşkere bête bihîstin ji bo diyarkirina maf û erk- ên wî, û her cure tawanbara li dijî wî.

**Benda 11.**

1. Herkesê ku bi tawanekê tête gunehbarkirin maf heye ku bêguneh bête hesibandin ta ku sûcê wî di dadgeheke aşkere de, ya ku hemû mercên ji parastina wî re pêwist misoger kiri be, bi awayekî yasayî were çespandin.

2. Nabe tukes ji ber kirin an nekirina karekî, ku di gava pêkhatina wî de li gora yasaya neteweyî an navneteweyî ne sûc bû, bête gunehbarkirin. Herweha nabe sizayeke ji wê sizayê, ya ku di dema qewimandina tawanê de hebû, tuntir pê bête dan.

**Benda 12.**

Nabe ku tukes toşî destêwerdana remekî ya nav jiyana wî ya taybet, malbata wî, mala wî an nameyên wî bibe, ne jî êrişên ser rûmet û şana wî. Herkesî li hemberî destêwerdan û êrişên wilo mafê parastineke asane heye.

**Benda 13.**

1. Herkesî maf heye ku di nav sînorên. dewletekê de bi serbestî hatûçûnê bike û cihê niştecîbûna xwe hilbijêre

2. Herkesî maf heye ku ji her welatekî, yê wî bi xwe jî tê de, derkeve û vegeriyê jî.

**Benda 14.**

1. Herkesî maf heye ji ber çewsandinê li welatên din daxwaza penahiyê bike û penaberiyê bi dest xîne.

2. Ev maf li wan kesan nakeve, yên ku ji ber sûceke ne rêzanî an ji ber kirinên dijî amanc û bîrdozên Neteweyên Yekbûyî hatine tawanbarkirin.

**Benda 15.**

1. Herkesî maf heye bibe xwediyê hemniştîmaniyekê.

2. Nabe ji tukesî bi awayekî remekî hemniştîmaniya wî bête standin, ne jî dibe ji mafê guhartina wê bête bêparkirin.

**Benda 16.**

1. Jin û mêrên resêw, bê tu bendên ji ber nijad, netewahî an olê, mafê mêrkirin an jinanînê û damezrandna malbetekê hene. Di dema ku dibin mêr û jin, di dema domahiya wê têkiliyê de û di dema berdanê de ew xwedî mafên wekhev in.

2. Mehr tenê bi erêkirina serbest û tewaw, ya kesên ku dixwazin hevdu bibin, dikare bête birîn.

3. Malbet (xêzan) hêmana xwezayî û bingehî ya civakê ye û xwedî maf e ku ji alî civak û dewletê ve bête parastin.

**Benda 17.**

1. Herkesî maf heye ku bi serê xwe an tevî kesine din bibe xwedî arzî.

2. Nabe tukes bi awayekî remekî ji arziya xwe bête bêparkirin.

**Benda 18.**

Herkesî mafê azadiya raman, wijdan û olê heye; di nav vî mafî de jî, azadiya ol an bawerîguhartinê û azadiya derbirina wan bi riya hînkirin, xerîkbûn, parastin û peyrewkirina dab û destûrên wê ol û baweriyê, çi bi tenê an bi komel, çi bi aşkereyî an bi dizî.

**Dumahîk di hejmara bê de.**

www.arsivakurdi.org

# Kuştina jinan

**Salih Cefer**

Her ku ez di nava rûpelên malperên kurdî de nûçeya kuştina jinekê dixwînim, hestên min bi kûranî tên sotandin û gelekî têm êşandin.

Naxwazim serê xwênerên xwe bi gotareke kilasîk li ser mafê jinê û sedema paşdamayîna wê binivîsînim û nejî bidim xwiya kirin bê çi pêwistî divê ku jin ji zordarîyê rêzgar bibin.

Tiştê ku bala min digişîne , gava ku bûyerek siyasî diqewime, rûpelên malperan tijî nivîs û gotar dibin, lê gava ku gulek ji gulistana civaka me tê qurçifandin tu tiştekî ji bilî kurte nûçeyekê nabînî, lê ya herî girîng ewe ku nivîskarên me bi tirsonekî nêzîkî vê yekê dibin û bi newêrekî rexneya civakê dikin, ji xwe hêzên siyasî tiştekî nakin, ji bilî weşana wê nûçeyê.

Nizanim çima wa li ber dilê min kelîya ku divê mirov bêje werin em tiştekî neyî kilasîkî bikin.

Eger bi rastî em dilşewatê paristina jinanbin divê em tiştekî bo sivikirina vê zulmê bikin.


Gelo wê çiqas xweşbe ku rewşenbîr û siyasetmedar û hemû kesên pêşverû di nava civakê de piştî kuştin yan xwekuştina jinekê xwepêşandanekê ji navenda bajêr bi rêkin û bidin xwiya kirin ku em li dijî kuştin yan xwekuştina jinanin û em van kiryaran şermezar dikin û li dij derdikevin . Bi vê yekê wê helwest were xweya kirin û bala civakê bê kişandin ku em bi van kiryaran ne razîne, lê gava ku hemû kiryar derbas dibin wek ku tiştek nebûye ev edet berdewam dike û zêdetir bibe.

Eger mirov tiştekî nikanibe biguhere, bi kêmayî divê nerazibîbûna xwe diyar bik.

.

Eger rewşenbîr û siyasetmrdar û hêzên pêşketî di civakê de li dijî vê qurçifandina gulan nesekinin, wê kî vê yekê bike.

Gelekî şerme ku di çerxê bîst û yekan de ji bo hezkirina di nava du kesan de mirovek bê kuştin.



Ta kengî wê jin werin kirîn yan firotin yan bi darê zorê bên dayîn û eger ew bêje na, gef lê werin xwarin û ev yek bibe sedema xwekuştinê yan xwe sewitandinê.

Divê em ne tenê îdî siyasetê bikin , divê em destên xwe bidin ser birînên civaka xwe, ne tenê bi nivîsandinan yan bi simînaran lê tiştekî li ber çavan bikin , tevî ku wê dilê hinek fewdal û êlperest û olperesrt û alîgirên wan ji me bimîne, lê divê ev yek bê kirin.

Bese bêdengîya li hember qurçifandina gul û kulîlkan.

14.02.2010

***Ev gotar ji malpera Avesta hatiye wergirtin***



www.arsivakurdi.org

# Dîsa Newroz Mêvan Û Pîroz e

Enehîta Mûrad

Weke hersal va ye heyva Avdarê, nîşana Buhara rengîn, bi bîanîn û boneyên xwe ve, wê dîsan weke hercar, li me bibe mêvan. Miletê Kurd,, bi çûk û mezinên xwe ve, bi xem –qisawet, hêvî û pêjnên xwe bilind bilind, ber ve jor geş bike.

Belkî îsal cejnên Avdarê, bê jan û êş biborin.Wê Çi bibe, eger pêlin hênik ji bayê azadî û hêmenî li ser rûyê miletê Kurd, yê reben û roj nedîtî, li wê Sûriya me ya şêrîn bilîsta. Zarok û ciwanên me jî, mîna xelkê cîhanê yên serdest wergirtine, bi cejnên xwe şabibana!

Ma gelo! Ev rêjîm ya li ser têxt palvedaye, çima li xwe napirse, ji berî dewran lê bizîvire û sûdê ji derdora xwe nagre.Hêjî, ewe di çavsorî û rikgiriya xwe de, li serê xwe siwar e. Pir rengên zordariyê li me dike. Wisan jî girtiyên 2009 an li bajarê Helebê, ta roja îro, ew bê sûc û guneh di binê hebis û zîndanan de mane.Yek gunehê wan ew bû, tenê ew Kurd in û hew.

Ta kîngê emê weha li benda heyameke demokratîk, wekhevî û aştiyê bibînin. Ta kîngê zar û zîçin me, wê di heyama biv, tirs û qedexkirinê de mezin bibin.

Erê ev bêbextiyên cavsoran , li vir- Sûriyê – li me dibe, her û her weha namîne, û çawa wê hertim wisan bimîne. Bêguman wê rojek bê , û bi ya me be ev roj nîzîke ne dûr e.

Pêdarî û vîna gelê me yê Kurd, bi gavine pîvayî li gel xebata basikên Tevgera niştiman perwer a Kurd û refên danezana Şamê , wê li rojên mandê cih bigre. Heyama cîhanî berve hevjîneke demokrasî, wekhevî bi azadî û aştiyane pejirandina mafên mirovan diçe.

Erê… Erê xwendevanê me , ma kî nizane , Ku ev gelê me yê Kurd , hemû rengên çewandinê lê bûne û dibin, wê di rojên bê de, di duhatiyeke pir nêzîk de , ev zordarî weke lekeyeke bi tu sabûn û avan nayê şuştin, li ser eniya zorkeran hertim ji nûguhayan re diyar û xuyan bike, û neviyên zorker û dagîkerên xaka me, wê çi û çiqas bi şerim û fehîtiyeke bê hempa li ser rû û rûpelên bav û kalên wan bi aşkere xuyan bike .



---

## PÎROZ BE

**Bi boneya cejnên Avdarê ( 8-21 ), desteya birêvebiriya NEWROZÊ, gelê Kurd bi jin , mêr , kal , pîr û zarokan ve pîroz dike , her weha jiyaneke xweş û geş tijî azadî û aştî ji wan re hêvî dike**

www.arsivakurd.org

dawiyê, bi navê malbatê, birêz Dr.Memo helbesteke bi şewat pêşkêş kir û sipasiya beşdaran kir. Ji bilî gotinên ku li ser gorê hatin xwendin, gelek birûsk ji partiyên Kurd, malperên Kurdî û kesayetyên navdar ji malbatê re hatine şandin, ji nav wan birûsakan, birûska weşana me NEWROZ û ya Kovara PIRSê bûn, deqên wan li jêr in:

## Birûska Sersaxiyê

Malbata nivîskar û rewşenbîrê Kurd ê dilsoz REZO!
Nivîskarên bi zimanê Kurdî!
Piştî kêferat û berxwedaneke derdora salekê bi nexweşiya penceşêrê re, rewşenbîr û nivîskarê zimanê Kurdî, kesayetiya dengewar û dilsoz, mirovhez û zîrek, birêz Rezoyê Osê ji nav me bar kir.

Bêgumane her kesê ku bi çand û rewşenbîriya Kurdî re têkildar û mijûl e, nav û dengê mamoste di kastîna rewşebîriya Kurdî û rola wî ya erênî di civakê de bihîstiye.

Dilê me hemiyan bi koçbarkirina birêz Rezo êşiya.

Hêvî û omîda me ew e ku cihê wî buhuşt be, serê malbat, mirov û xwediyên wî, rewşenbîrên Kurd hemiyan xweş be.!
Weşana **NEWROZ**/05.03.2010Z ,2620K

## Birûska Serxweşiyê

*Malbata mamoste REZO!*
Rewşenbîr û berketiyên zimanê Kurdî!
Me di desteya Kovara PIRSê de, bi dilekî tev kul, keser û kovan nûçeya dilêş a koçbarkirina rewşenbîrê Kurd ê navdar, endamê payebilind ê Kovara me Rezoyê Osê bihîst.

Buhuştî, di dirêjahiya temenê xwe de, ji bo ziman, wêje û toreya Kurdî xebateke tekûz û pîvayî bi rêve biriye. Li ser vê rêya dirêj a tev rêl û kelem, gelek cefa û astengî dîtine, lê wî bi dilê germ û hişê xwe yê vekirî ew derbas kirine. Weke me bira û mamoste Rezo di xebata hevbeş a Kovara Pirsê de naskiriye, ji bo kar û xebatên bilindkirina asta ziman û wêjeya Kurdî, ew mirovekî cansivik û pêşeng bû, bê dudilî, erk ustubarên xwe pêk tanîn.

Hemberî vê boneya gewre, Kovara PIRSê reş girê daye, bi melûlî û ustuxwarî gurzek gul diyarî rewanê wî dike, serxweşiya hemî rewşenbîr û berketiyên ziman û wêjeya Kurdî dike.
Bila gora te buhuşt be mamoste Rezo.
Serê malbata we xweş be!
Rezo, yek ji endamên damezrêner ên hevbenda kawa ya çanda Kurdî bû, ya gelek pirtûk û belgeyên hêja wergerandine ser zimanê Erebî. Herweha, wî di desteya Kovara Stêr a bi zimanê Kurdî de xebat kiriye. Gelek gotar, çîrokên zarokan, kurteçîrok û lêkolîn bi navê Aro, Rezo, Azad…di kovar û weşanên bi zimanê Kurdî de çi li welat çi li derveyî welêt nivîsandine. Ji sala 1993an ve, di desteya Kovara PIRSê de xebitî ye û ev berhemên jêr di hejmarên wê de weşandine:
**Kovar PIRS**/05.03.2010Z _2620K
**************************************

**Dumahîk : JI Ê MÊRTIR RE**

Klêvayê di defterxanê de cilên birîndaran ji hev dikirin, tiştên di bêrîkên wan de seh dikirin û ew datanîn refikên dolaban. Klêvayê di bêrîka cilên Sarc de resimê xwe yê ko xwîna Sarc sorkirî bû peyda kir. Klîvayê gava ev dît ji xwe re got:"Ê mêrtir birîndar bûye û îro di xestexana me de ye". Klêva rabû, çû cem gerînendeyê xestexanê û jê destûr xwest ko êdî di xizmeta nexweş û birîndaran de bixebite. Gerînende destûra wê da û Klêva xwe gihande ber serê "ê mêrtir". Birîna Sarc xedar bû; dilê wî ji ber ve çû bû. Bijîşk bêgav man û lingê wî ê çepê jêkirin. Sarc gava çavên xwe vekirin li ber serê xwe xwediya teswîrê dît, roj bi roj ber bi xêr bû. Klêvayê terka wî ne da û piştî ko Sarc ji xestexanê derket, bû jina wî. Îro herdu jî divê fabrîkê de dixebitin. Sarcê yekling nema dikare çekan hilgire lê dikare wan çêke, jina wî jî arîkariya wî dike". Gotinên mihendis li hire qediyan û em tev de ketin xwarinxanê. Bêhemtê xwe em li wan digeriyan. Dawiyê me ew peyda kirin. Bûk û zavê xwe dabûn alîkî û li rex hev rûniştî taxafîn û taştiya xwe dixwarin.

(*) **Kovara RONAHÎ-Hejmar 8- Yekşemb-1ê Çirya Paşîn 1942-Rûpel(8-9).**

www.arsivakurd.org

**Dumahîk: Zimanê…**

ew ziman hemî li ser dev û lêvên xwediyên xwe buha û şêrîn in, ne tenê wisa, lê belê pirengiya zimanan, hêz, bedewî û dewlemendiyê dide çand û wêjeya cîhanê, çiku bi riya zimanan, gelên cîhanê dikarin hev nas bikin, çand, tore, zaniyarî û hunera hev nas bikin û ji bo berjewendiya mirovatiyê a hevbeş, ew dikarin wan pêşve bibin û tiştine teze ji komela navnetewî re peyda bikin. Lê belê wekî çawa her miletek li ser rûçkê vê zemînê dijî, xwe bi ziman û netewa xwe bextewer dibîne, em Kurd jî mafdar in xwe bi ziman, tore û netewa xwe bextewer bibînin. Divê em ji bîr nekin, ta ku em xwe bi zimanê xwe yê Kurdî serbilind bibînin jî, berî her tiştî divê em xwe hînî xwendin û nivîsndina pê bikin.

Dibe ku hin ji we bibêjin: Keko, ma di siha merc û hoyên îroyîn de ku li welatê me Sûriyê, bikaranîna ziman, folklor û çanda gelê me li me qedexe ye, çilo û çawa emê xwe hînî xwendina bi zimanê xwe bikin?. Ma dibistanên bi zimanê Kurdî li welêt hene ta ku em û zarokên xwe di wan de bixwînin?.

Bi rastî, ew mafdar in wê pirsa jorîn bikin, ji ber ku mixabin, destelatê derfet û riyên fêrbûna zimên li ber gelê me girtine û bê ku sedemine tirsnak û durust hebin, ew bi çavê dijminatiyê li zimanê me dinere!..Îro, çi ziman li dinyayê hebe, derfeta fêrkirina wî li Sûriyê heye, çi Ingilîzî, Firensî, Almanî, Swêdî …yan jî Îtalî be, lê belê, zimanê Kurdî, ku ew zimanê hejmareke mezin ji welatiyên Sûriyê ye, li Sûriyê qedexe ye?!!.Vêca, ka çi rê li ber me hene birano?. Yan divê em dstên xwe deynin ber ruyên xwe û ji ber vê sitema dijwar ku li me û zimanê me dibe em rondikên xwînê bibarînin, bi vê kiryarê jî, dilê tu kesan bi me na şewite, rê li pêş me dûz nakin û na bêjin birano, wekî hun ewqasî bi şewat digrîn, de vaye emê ji we re dibistanên Kurdî vekin, herin di wan de bixwînin!!.

Eger tu xwe hînî zimanê xwe nekî, ez xwe hîn nekim, filan û bêvano xwe hîn neke, ma gelo piştî çend salên din rewş û pergala zimanê me çawa dibe? Gelo, peyv û gotinên Kurdî ji devoka civakê winda nabin? Ma gelo, pê re jî, gramêra zimanê me qels û lawaz nabe? Ma gelo ev rê ne rêya pişaftina ziman û gelê me ye? Ma em hemî nizanin ku pişaftina gelan rêya windabûna wan e? Ma gelo qîma kîjan Kurdî bi wê yekê tê ku em zimanê dayika xwe winda bikin û di paşerojê de bi zimanê geline din bipeyivin?!! …

Pêwist û ustubarekî netewî ye, bi xebat û karînên xwe yên xwe-xwetî, em xwe hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bikin, çand, wêje û folklora gelê xwe ji windabûnê biparêzin û lê xwedî derkevin, di vî warî de, em dikarin yardimî û arîkariyê ji zanyar, pispor û mamosteyên zimên wegirin û ez bawer im, ji bo vî karê pîroz, rewşebîrên me yên dilsoz her dem û gav amade ne.

**Dumahîk : Berêz Mihyedîn ….**


divê berpirsiyar be jî. 4-Yanê mamoste hin caran ji bîr dike ku sekretêrê P.Y.D.K de , û axaftina wî ji bo ragiyandinê ye , û têrmên şaş ku bi kar tîne ziyanê dighîne siyaseta partiya wî û doza Kurd li Sûriyê.

Herdu mijarên rexneyî yên herdu mamostên ku li jor bi nav bûne, di baweriya min de ,ne ji bo serastkirinê bûn . Ew ji bo kulandina Şêx Alî û partiya Yekîtî bûn . Min bihna kîn û zikreşiyekê ji herdu mijaran kir. Herweha bêberpirsiyarî ji helwest û nirxandinên wan hildikelî.
Zatirê wergerandina erebî yê ku bixwîne , û ew bersivên bi kurdî nebihîstibin , wê wêneyeke ne baş li ser xwediyê bersivan û partiya wî bibe . Ji ber ku pir hevok yekcar bervajî hatine wergerandin.

www.arsivakurdi.org

# Zimanê Kurdî, Zimanê şêrîn

Rêberê Silîvî



Dema pirsa zimanê Kurdî tê meydanê, navê rewşenbîr û zanyarên mezin û payebilind, ku di warê ziman û toreya Kurdî de ew xwedî berhem û rol in û ji gelê xwe re bûne sembol û nîşan, mîna Seydayê **Cezerî**, **Mele Ehmedê Xanî, Nalî, Manî, Feqê Teyran, Malbata Bedirxaniyan, Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrî Can, Cigerxwîn**, **Qenatê Kurdo**, **Mele Ehmedê Namî**, **Hejar, Hemze Begê Muksî** …û gelekên dîtir têne bîra mirov.

Navê van torevan, helbestvan û zanyarên me yên bi rûmet tê bîra me, ji ber ku wan xebateke mizinî bê hemta ji bo parastin û pêşvebirina ziman û wêjeya Kurdî kirine, afrandin û dahênanên xwe yên nirxdar pê nivîsandine û ew ji me re hiştine, herweha, ji ber ku bi saya serê wan lehengên nemir, me ziman, çand û folklora xwe parastiye, bi serbilindî û bextiyarî em bi zimanê xwe yê zikmakî dipeyivin, pê dixwînin û dinivîsin. Li seranserî welêt û li derveyî sînorên wî jî, ango li mişextî û derbederiyê, îro, bi hezaran keç, xort, mêr û jinên Kurdan bi coş û hestine germ, bi zimanê Kurdî yê şêrîn helbest, gotar, roman û hemî reng û cureyên toreyê dinivîsin, ew ji ber zimanê xwe yê ciwan û delal fedî nakin. Ma çawa ewê ji zimanê **Cezerî** yan jî ji yê **Xanî** fedî bikin ku îro berhemên wan yên bi vî zimanî hatine nivîsandin,li cîhana wîjeyî bê mînak û temtêl in?!.. Ew zimanê bendkirî ku bi dirêjahiya sedsalan bi her hawî şerê hebûna wî bûye û hê jî dibe, wî li ber xwe daye, berevaniyeke rewa û serkeftî di ber hebûna xwe de kiriye û ji gelên cîhanê bi tevayî re teqez kiriye û daye zanîn ku ew zimanekî sax û pêdar e, rehên xwe di xaka welêt û dilê gelê Kurd de kûr û dûr berdane, tu hêz, tu kîn û tu zikreşî, nikare vî zimanî bihejîne yan wî ji holê rake.

Gotin, peyv, metelok, çîrok û çîvanok, stran, dîlok, lawik û heyranok, li kêleka wan jî pirtûk, destan, kovarên Kevin mîna **Hawar, Roja Nû** û **Ronahî** yê... h.w.d, ew hemî îro ji gelê me re pêma û sermiyanine dewlemend û zengîn in, herweha ew mak û jêdera jîn û vejîna toreya Kurdî ne. Pêwist e nifşê me yê nû, keç û xortên me yên nûhatî, bi Kurdbûna xwe şanaz û serfiraz bin û bi zimanê xwe yê Kurdî jî payebilind bin, ew xwe hînî xwendin û nivîsandina pê bikin û ji ava wan kaniyên toreya Kurdî a Kevin a resen têr vexun û bidin ser şopa wan comerdên ku ji me re bûne stêrkine geş û rêya pêşveçûnê li ber me dûz û ronî kirine.

Rêz û hurmeta me ya giran ji hemî zimanên gelan re heye, ji ber ku

**D.R.(11)**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org